Среднюю Азию и Казахстан. Всего в 1944 году было депортировано из Грузии 6297 семей, это 2750 человек. Число представителей курдской национальности среди них не известно. В Алматинскую область попало 2544 семьи переселенцев, в Южно-Казахстанскую – 2223 семьи в Джамбульскую область – 822 семьи, в Талдыкурганскую область – 337 семей. Переселенцев привезли в казахстанскую степь, они не привыкли к жаркому климату степи, т.к. жили всегда в горах. Поэтому некоторые переселенцы, не выдержав перемены, бросались в реку или поджигали себя.

В 1944 году депортировали не только курдов, но и чеченцев, кабардино-балкарцев, карачаевцев, турок-месхетинцев и других. Это было во время Великой Отечественной войны. Люди жили в нищете, отдавали все силы, чтобы помочь воюющей армии. Мужская часть населения была призвана на защиту страны от жестокого




Ш. Р. Дурсунов - бывший первый заместитель прокурора Алматинской области

врага. Из каждой курдской семьи 5-6 человек ушли на фронт, кто-то вернулся героем, в орденах и медалях, кто-то не вернулся домой. Можно назвать много имен героев: Бакир Мустафаев (Герой Советского Союза), Айдын Алиев (Орден Великой Отечественной войны 11 степени), Сари Асланов, Азалхан



Ветераны ВОВ и труда Алматинской области

Мустафаев, Осман Алиев (Орден Великой Отечественной Войны 111 степени), Зия Алиев, Агит Гусейнов, Осман Сулейманов, Мурсал Дурсунов, Агали Алиев, Атам Мугаев. Эти люди вернулись домой с войны, но их семьи уже были депортированы в Среднюю Азию и



Алиев Зия Бадырханович – Кавалер боевых орденов и медалей

Казахстан.

Об этом вспоминает житель села Заря Восток Айдын Алиев:

– Участником Великой Отечественной войны я стал в 17 лет. Воевал за освобождение «Малой земли», дошел до Будапешта. Видал много людского горя. В 1946 году я вернулся в родные края. В родном селе ноги сами несли меня к дому. Но на пороге меня встретили чужие люди. Я спросил у одного из них имя, он ответил «Вахтанг». Я спросил: «Вахтанг, это твой дом?» Он ответил мне: «Да!» «Давно здесь живешь?» - спрашиваю его. Отвечает: «Три года». «Хозяин этого дома я», - сказал я. Он ответил: «Государство отдало этот дом мне!»

Я ходил в районный военкомат, там и узнал, что семья моя депортирована в Казахстан. Искать семью пришлось целых два месяца. Наконец я их нашел. Я думал, что это несправедливо: я защищал Родину, а мою семью депортировали, когда курдов депортировали из Грузии, им говорили, что депортируют для их же блага. Поскольку они живут у границы с Турцией, на них турки могут совершить нападение и даже развязать войну.

Свидетель тех дней 90-летний дедушка Зия Алиев об этом говорит так:

– Было утро 12 ноября 1944

щами погрузили в товарные вагоны по 5-6 семей вместе. Мы везли продукты с собой. Условия были не человеческие: никакой гигиены, санитарных норм. Туалетом служил угол, отгороженный занавеской. Обычаи тех времен у курдов были крепки. Невестка не имела права при свекре даже пищу принимать, не то что туалет посещать. Невестки не ели в вагоне, чтобы не нарушать обычая. Так, с множеством проблем, через 20 дней мы прибыли в Казахстан.

Прошло 75-лет. Курды Казахстана обжили новые для них места. Они выжили благодаря местным казахам и русским, которые делились с ними теплой одеждой, одеялами провизией. Здесь в Казахстане, в Советское время курдские дети получили среднее и высшее образование. Среди них теперь десятки докторов наук, есть академики, профессора, люди разных профессий.

Сегодня в республике функционирует ассоциация «Барбанг»



Ш. К. Каримов – Президент строительной фирмы «Триада»

курдов РК, курдские культурные центры во многих городах и областных центрах Казахстана – в Алматы, Алматинской, Южно-Казахстанской, Жамбылской и других областях.

В местах компактного проживания курдов созданы творческие коллективы – фольклорные ансамбли, поэтические кружки.

Благодаря мудрой политике нашего президента Нурсултана Абишевича Назарбаева все народы и народности, проживающие в Казахстане имеют все культурные права, в том числе и курды. В Казахстане выходит ежемесячная республиканская курдская газета «Жийана курд», литературный журнал «Нубар». При ассамблее народа Казахстана есть курдская воскресная школа. В центральном государственном музее создан уголок курдской культуры (в Алматы и Астане). В местах компактного проживания курдов в школах ведутся уроки курдского языка. В Казахстане выпускается художественная литература на курдском языке. Мы, курды Казахстана, желаем всему казахстанскому народу свободы и процветания.

**К.И.Мирзоев**  
Член Совета Ассамблеи народа Казахстана  
Зав.кафедрой восточных языков КазНПУ им. Абая  
Доктор филологических наук, профессор

года. Солдаты окружили наше село. Тревожно раскричалась скотина, лаяли собаки, плакали дети. Нам дали два часа на сборы: вещи грузили в машины. Много осталось там: вещи, продукты. Нас отправили на станцию Боржом, мы провели одну ночь. Утром нас с ве-



# Ji bo BÎRANÎNA Keremê Anqosî

Waletpewer, zanyar, nivîskar, rojnamavan, rohilatnas, karmendê civaka kurdên Gurcistanê yê bi nav û deng, berpirsyarê radyoya Ronkayî ya Gurcistanê mamosta Keremê Anqosî di temenê xwe yê 81 salî de, piştî nexweşya pir xeder, çû ser dilovaniya xwe.

Anqosî 10ê çiriya pêşîn 1937an li bajarê Tbilîsiyê, di maleke mihacirên ji Împeratoriya Osmanî ji diya xwe bûye. Dê û bavê wî, ku wek hemû kurdên Gurcistanê bi dîne xwe va êzdî bûn

Welatparêzê kurd Keremê Anqosî sala 1956an dibistana Gurcistanê ya orde bi mîdala zêr kuta dike û hema wê salê dikeve ûnivêrsîtêta dewletê, fakûltêya fizîkayê. Piştî salekê, bona ziman, dîrok û kûltûragelê xwe bi kûrayî fêr bibe, derbazî fakûltêya Rohilatziyê dibe, ku sala 1961ê bi serketî xilaz dike. Sala 1963an ew li Înstîtûta Rohilatziyê ya Akadêmiya Zanyarî ya Gurcistanê derbazî ser kar dibe, pêşî dibe laborant, lê paşê karmendê zanyarî. Sala 1979an gazî wî dikin bona li Komîtêya Navbendî ya Partîa Komûnistiyê ya Gurcistanê da derbazî ser kar bibe û ew heta sala 1991ê li wir dixebite. Bi kar ra tevayî Dibistana Bilind ya Partiyê jî xilaz dike. Bi xebata zanyarî û partyê ra tevayî ewî karê civakê jî bi serketî dikir bona bilindkirina dereca bineciyên kurd yên ronahîdarîyê-perwerdeyê, amadekirina kadroyên ronakbîr di nav gelê xwe da, bona



hînbûna ziman, dîrok û edebiyeta kurdî, parastina erf-edetên millet, naskirina mafên gelê xwe yên sîyasî û sosîalî.

Keremê Anqosî hela dema xwendkar bû, Şewra aliyê xebata bi gencên kurd ra saz kir û heta sala 1975an serokatî lê kir. Bi serokatîya wî komên kurdî yên folklorê hatine sazîkirin û navên hinekan jî wan ev in: „Koma kurdî ya kilam û reqasên gelêrî“, „Govenda kurdî“, „Oy, Narê“, koma zaran ya sitiran û reqasana „Dîlan“, Şewra mamostayên kurd, Şewra parlamêntarên kurd yên Tilbîsê, Komeleya wênekêşên kurd, Ünivêrsîtêta Gelêrî bona bineciyên kurd li rex Hevaltiya „Zanyarî“, gelek konsêrt û êvariyan şahiye, sêminarên derheqa dîrok, çand,

ziman, edebiyet û dîne kurdan, rasthatinên bi karmendên ulmî û hunermendiyê yên bi nav û deng, bi kurdên ji welatên dereke, cejinên ruhaniyê yên kurdan dihatine derbazîkirin. Komên kilam û reqasê, ku ew serokatî lê dikir, gelek caran li bajar û komarên Sovyeta berê û welatên dereke konsêrt dane, alî pêşketina tîatroya kurdî ya li Tilbîsê kirîye.

Sala 1978an Keremê Anqosî bingehê beşa kurdî ya radyoya Gurcistanê ya dewletê danî û heta girtina wê – 1ê çileyê pêşîn sala 2004an berpirsyarê wê yê sereke bû; ewî fonda sazbandiyê ya gelekî dewlemend saz kir, gelek

sitiranên kurdên Gurcistanê qeyd kir û kir milkê gelê kurd. Ewî herwiha bi zimanên cuda-cuda gelek gotarên zanyarî û pirtûkên cuda çap kirine derheqa ziman, edebiyet, dîrok, êtnografiya, folklor, dîne êzdiyan da, ewî elfebaya pêşîn ya du zimanî ya kurdî-gurcîkî saz kir, çend pirtûkên derheqa dua û dirozgeyên êzdiyan da dane çapîkirinê, rêdaktori li çend pirtûkên bi zimanê kurdî kirîye. Helbest û serpehatiyên wî bi zimanên kurdî û gurcîkî hatine weşandinê, ewî xeber û sazbandiya çend sitiranên kurdî yên bi nav û deng nivîsîne, wek sitiranên «Lêxin, birano», «HOLA ÊZÎDE SORE», «Ax, kuştim Şîrîne», ku li ser bingehê gotinên Cegerxwîn hatiye sêwirandin, ango

sazbandiya wê hatiye sazîkirin.

Keremê Anqosî sala 1999an bi kîsî xwe li Tilbîsê dest bi weşana rojnameya «Gêlavêj» kir, ku rojnameya kurdî ya pêşîn bû li wê komarê û bi xwe jî berpirsyarî lê dikir. Ew herwiha tevî çend kongre û konferansên navnetewî yên zanyarî bûye, ku derheqa problêmên rohilatziyê, kurdziyê û dîne êzdiyan da bûne. Sala 1992an bingehê rêxistina bi navê «Civaka hemwelatîyên kurd yên Gurcistanê» danî. Sala 1995an pênc rêxistinên kurdan yên civakî ketine nava wê rêxistinê. Paşê, sala 1998an bi înişiatîva wî ew hate binavîkirinê wek «Yekîtiya êzdiyên Gurcistanê». Demekê ewî serokatî li wê rêxistinê kir, lê paşê yek ji wan kesan bû, ku bû bingehdarê rêxistina «Fonda navnetewî ya parastina maf û mîrata dîni ya gelê kurd», «Navbenda dîne Êzdiyan», «Yekîtiya ronakbîrên kurdên Gurcistanê», «Fonda sêksyona kurdî ya YÛNESKOyê li Gurcistanê» saz kir.

Keremê Anqosî gelek caran di komîtê û komîsyonên Gurcistanê yên cuda-cuda da hatiye hîlbijartin, bûye nûnerê gel li Dadmendiya Gurcistanê ya tewrebillind da, bûye endamê sedirtiya Şewra kalemêrên gelên Kavkazê û her wakî din. Ew xelat û mîdalyayên dewletê va hatiye pêşkêşîkirin, di nav wan da bi «Ordêna şerefê ya Gurcistanê» va. Ew endamê Yekîtiya Rojnamevanên Gurcistanê ye. Lê xelata here mezin jî bo wî ew bûye, ku gelê kurd yê Gurcistanê keda wî bilind qîmet kirîye û navê «Rêvebirê kurdan» yekê kirine.

Ew zewiciye û xwedî du keçane: Medîna û Gulçîna.

Keremê Anqosî di yekê çiriya pêşîna 2019an de li Tilbîsê, paytexta Gurcistanê, çû ber dilovaniya Xwedê.

## Гулистан Суло – живое очевидец депортации



депортировали в Казахстан. Она видела много горя, холод и голод. Гулистан Сулоевна любит свой Казахстан и воспитывает своих внуков, родившихся уже в независимой стране, в духе нового казахстанского патриотизма. Гулистан Алиева давно стала своим человеком на казахской земле. Жизнь не сломала ее, а только закалила ее характер, укрепила волю. Сегодня она воспитала своих детей и внуков, которые работают во благо страны. Она как и многие депортированные люди, мечтает чтобы ее потомки не испытали, тех страданий, которые выпали на ее долю. Она всегда говорила, что благодарна казахскому народу, который во время депортации оказал нам братскую помощь. И что, никто и никогда этого не забудет.

92 летняя бабушка Гулистан Сулоевна, сегодня является жизненным примером для каждого из нас, это наша живая история с тех незабываемых 1944 годов. В ее лице мы гордимся жизнестойкостью родного народа, у него достойное будущее, когда есть такие дочери, такие матери. Так как во время Великой Отечественной войны Гулистан Алиева ждала своего мужа, опоры, который воевал за свою Родину. Как каждый патриот своей страны она работала в тылу не покладая рук, в то же время, уделяя время воспитанию детей. Она храбрая женщина, которая сумела сохранить свой очаг. В 1944 году из Аспиндзинского района Грузинской ССР Гулистан Сулоевну вместе с сотнями курдских семей

Она со своим супругом Зия Бадыханом по возможности помогала соседям, мало имущественным семьям и инвалидам. Научила этому своих детей и внуков. Она заслужила уважение и любовь окружающих, поэтому в народе ее называли «Курдской матерью Терезой». Гулистан Сулоевна - трудолюбивая, скромная женщина, заботливая мать, добрая бабушка. Как истинный патриот своей страны, она пользуется уважением и авторитетом среди курдов, казахов, турок, азербайджанцев и представителей других этносов Алматинской области.

Мы желаем бабушке Гулистан крепкого здоровья и счастья.

## Памяти Ибрагим Алиева-заслуженного деятеля курдской общины

Курдская общественность Казахстана понесла большую потерю, на 88 году ушел из жизни народный депутат, «Почетный гражданин» и «Отличник народного образования Казахской ССР» Ибрагим Алиевич Алиев.

Ибрагим Алиев родился 7 ноября 1931 года в селе Даш-Арх Нораинского района Нахчиванской АССР.

В 1950 г. окончил Казахскую среднюю школу в селе Новотроицкое.

В 1954-1956гг. учился в физкультурном техникуме в городе Алма-Ате. После окончания техникума работал учителем физкультуры в Новотроицкой казахской средней школе.

В 1966-1972 г. окончил педагогической институт им. Абая в Алма-Ате и работал учителем географии, в средней школе имени А. Макаренко (ныне ср. школа имени Аль-Фараби), а с 1972-1995 г. стал директором школы.

За вклад в развитие образования Казахстана Ибрагим Алиев был награжден значком «Отличник Народного образования Казахской ССР». С 1986 по 1991 г. был членом бюро Шуского райкома партии. За трудовые заслуги Ибрагим Алиев был награжден значком ВДНХ СССР, значком «Победитель Социалистического Соревнования» медалью «За освоение Целинных земель», медалью Ветерана труда, а также юбилейной медалью «10 лет Независимости республики Казахстан», юбилейной медалью «60 лет Великой Победы», значком «60 лет СССР», значком «Шу ауданына 80 жыл».



Ибрагим Алиев не раз избирался депутатом сельского, районного советов и районного маслихата, был Почетным гражданином Шуского района.

Ибрагим Алиев был членом курдской ассоциации и принимал активное участие во всех важных мероприятиях ассоциации. Он внес огромный вклад в развитие образования среди курдской молодежи.

Он останется в памяти как патриот своего народа и своей страны Ассоциация «Барбанг» курдов РК выражает глубокое соболезнования родным и близким Ибрагима Алиева.



# Rûpêla poêziyayê

## Elîyê Evdilrehman



Elîyê Evdilrehman nava edebîyata kurdê sovyêteda navekî teze nine. Ew xudanê çend kitêbane. Ewîgelek miqale, oçêrk, serhatî, roman, helbest, poyêma nivîsiye, bi wergêriya efrandinê bedewetîyêva mijûl bûye. Elîyê Evdilrehman sala 1920-an Bakûrê Kurdistanêda ji dayik bûye. Kikêba xweye pêşîn bi nave "Xatê xanim" sala 1959-a çap dike. Dû ra romana "Dim-Dim", serhatîya "Morof", "Jina kurd", "Gundê mêrxasa", berevoka "De", "Gulistan" û êd din.

Elîyê Evdilrehman 20 Çile (yanvarê) 1994 çû ser dilovanîya xwe.

### Weten

Weten dêye,	Xudan warim,
Rewşa meye.	Tam extiyarim,
Ezî şame,	Bextewarim.
Kurê wême.	Bi heqîqî,
Aha lema	Tev birê me,
Hemû dema,	Ez uzvekî,
Ezî kawim,	Wê malême-
Zef kubarim,	Cîyê azayê,
Pişt-hevalim,	Bext û şayê...

### Dinê bidne pišta min

Dinê bidne pišta min,  
Talaşa min nîne,  
Ezê teyax bidim,  
Hê ser qamê xweme.

Dinya çiqas girane,  
Derd wê girantirin,  
Min derdê şêr dîtîye,  
Ezwî îdî nevinim...

Dinêda hê dê hene,  
Çevê wanî rêye,  
Ku ewladê wan xerîb,  
Sax silamet bête.

Qey ji derdê wan dayika  
Ro dixwaze berjêrve.  
Ûber dilê wanda bê,  
Hêsirê wan temizke.


Dîsa dilê dîya hêsa nave  
Û kel danayne,  
Çevê wan timê rêye,  
Ku ewlada bivîne...

Ji derdê wan, derdêdîya,  
Ez dinalim, dikalim,  
Çar-çarnikal li dinê  
Gazî evda ez dikim:

-Şerbaza, zorba, xweyîsilaha  
Mehkem gemkin,  
Nehîlin bo qira meriv  
Çekê teze derxin!

Dinya çiqas girane,  
Lê derd wê girantire,  
Ezê dinê bikim piştî,  
Tek wîrda şer neve!...

## Barîyê Bala



Helbestvan, nivîskar, dramatûrg Barîyê Bala li Ermenistanê gundê Demircîyê sala 1937-a ji dayik bûye. Helbesta wîye ewlîn sala 1957-an bi sernivîsara Dayika min rojnama Rya Teze da hatîye weşandinê. Efrandinê Barîyê Bala bi dewlemendbûna janrava berbiçevîn. Bi helbestava tevayîew usa jî nivîsara vekirî dinivîse. Gelek pirtûkê Barîyê Bala neşirbûne: "Dinya min", "Kuda herim", "Dilbera min", "Dayik", "Kulîkên neçilmisî", "Deh bûyer", "Zerdeştê kal" û yê din. Efrandinê Barîyê Bala bizimanê ûrisî jî hatine wergerandinê û neşir bûne.

### Gelê Qazax, cejna bîst salîya serxwebûna te pîrozbe

Ez kurdekî be hêlîni, welat dûrim,  
Xêlek deme, bê xof, bê tirs, rihet virim.  
Pir dîroka hevdişêrim pêl û pêle,  
Diroka te, wek dîroka gelême tele.

Welatê te tîş- tîş kirine gelek cara,  
Hespê xwe lêbezandine pir xwînara.  
Hebûna te destê zorê tew birine,  
Gir hûrên te qema ra derbaz kirine.

Lawê Qazax pêş neyara mêl nebûne,  
Boy axa dê ruh- canê xwe buhurîne.  
Derbên giran ser neyar da xar kirine,  
Welatê xwe hovî, hara xilaz kirine.

Resûlê xwedê dinê ra îslam anî,  
Kurd Selheddîn temelê  
xwe qayîm danî.

Rûyê Pyotr Evropayê rewaq vekir.  
Bok Nûrsûltan Astaneke nû zû çêkir,  
Ber gelê xwe dergê dinê fire vekir.

### Însanê mezin

Patşê dinê te anîne welatê xwe,  
Da nîşandan erf û edet, dîroka xwe.  
Rîya hevirmûş nav denge, him şerefe,  
Bajar, gundên te çêkirine, bûne zehfe.

Qazaxstan te kirîye êdî cînet,  
Kîrnên teye mejûya dûr, bûne erbet.  
Nêron Roma kire rijî, lê mêze kir,  
Te welatê xwe xemiland qutnî lêkir.

Kîrnên te pir kirina evzeltirin,  
Gelek mizgevt, dibistan te bilind kirin.  
Dîrok tu car te bîr nake, qelbê mezin,  
Bin sîya te em vir dijîn, nakin gazin.

Nav emir da bîst sal demeke hindike,  
Gel ku yek be, çi bixwaze, wê wî bike.  
Welatê dê tew dinê ra te kire nas,  
Hemû dayik naynin dinê lawê mêrxas.

Sed sî millet li vir bûne dost û bira,  
Ev edlayî, qet tunene li tu dera.  
Boy xatîre me mêvanê bê ref, dûr war,  
Xwedê te ra emrê dirêj bişîne par.  
Ala Qazax wê tim xan be nav ala da,  
Navê teyê bê weklandin tew qurna da.

## Mecîdê Silêmin



Helbestvan û dehbêje û sazbandê kurdê sovyêteda Mecîdê Mehmedê Silo (Mecîdê Silêmin) sala 1937a li gundê Semekaşê ya Ermenistanê ji dayik bûye. Mecîdê Silêminê sarokatîya xweda ji zargotina kurdî pir hiz kirîye.

Sala 1957a diçe radîyo Yêrêvanêye kurdîda kilama distirê. Ewliwira xwe dide kîvê çawa dengbêjekîbaş. Wî tev Zadîna Şekir, Sûsîka Simko, Aslîka Qadir, Belga Qado, Sebra İsmeyil, Huseynê Eylêz, Sîsa Mecîd kilam strane. Helbest û klâmê wî rojnema "Rya Teze", "Kurdistan", "Axîna welat", kovara "Nûbar" û almanaxa "Bahara teze" da hatine neşir kirinê.

Mecîdê Silêmin 29-ê Tebaxê sala 2018 a çûye ser dilovanîya xwe.

### Selam tera, can Qazaxstan

Selam tera, can Qazaxstan,  
Selam tera, xweliya xopan.  
Xemilîyî bûyî gulistan,  
Selam tera can gulistan.  
Heya te bûye barisran.  
Eşq û şaya dila pêra,  
Te em şa kir ruh û can.  
Selam ji wê, eşqa şayîra,  
Hemû şayîr şêrê xweda,  
Dipesinin heyra te pir,  
Mecîd nava kilamêda,  
Te dike hemberê lal û dur.

### Bedewê

Wey bedewê, wey bedewê,  
Dilê minda gozel kewê,  
Xewa xûnkelê şîrîne,  
Neve bayisê min vê xewê.  
Bese tu min bidî cefê,  
Te ez anîme ber wefê,  
Bide min sozê kutasîyê,  
Suret sora, sîng sedefê.  
Bedew rinda gerdên morî,  
Pir bedewî sûret sorî,  
Dilê min li te bengîye,  
Dilê bengî neke gorî...

### Dilê min

Çima tuyî melûl jarî dilê min,  
Dikewgirî, kûr dinalî dilê min.  
Nalîna te tê çar alî dilê min,  
Diherim boy te vî halî dilê min.

Ne tu kurdî, ez bi xwe dilê teme,  
Kurdistanê xûn dikişê wek çeme.  
Lê çar negirîm, ez çar nekim xemê kûr,  
Ça nehelim, boy Kurdîstana xune nûr.

Heta rojkê emir bikim dunyayê,  
Derdê welatîji nav dilême dernayê.  
Ezê timê bigrim, bikim ax keser,  
Heta mirazê dilême neve mîyaser.

Ne mirazê me azaya welête,  
Ne ew xastin bona her kurdî nête.  
Ese, Yeşîr nêre bive mîyaser,  
Yê ji nava dila derê xem keser.

## Salihê Heso Seyadî



Salihê Heso Seyadî, 1ê gulanê sala 1940-a li gundê Mahmûdkendê (qeza Naxçivanê) ji dayik bûye. Ji sala 1992-a , di kovara Nûbarê da cigirê berpirsyar û rojnama Kurdistanêda jî nojnamegir dixevite. Pey xebata rojname û kovarêra, wîda mehkem hewes, ruhdarî pêjda tê. Lema jî Salihê nivîsarên xweyesalava hazir, dîsa li ser dixevite û yê teze dinivîse.

Gelek helbest serhatîyên Salihê Heso rûpêlêd rojnama û kovarada hatîye çapkirinê ("Rya teze",

"Dengê kurda", "Nûbar", "Asîya daûsî", "Kurdistan", "Sovêt Ermenistanî" û yê din). Salihê Heso Seyadî helbestvan, prozaiik, û pûblîsîstekî layîqe. Goveka efrandinê wî dewlemend û rengbirenge.

### Mala biratîyêye mezin

Qazaxsran! Ey welatê şênî bedew,  
Bûye mala bira, giş dijîn bedew,  
Vekirîye paşil, gelek mileta,  
Têda derbazkirin, zef baş û bêsew!

Ewladêd wê; Cambûlê eyan,  
Abay, Velîxanovê dîrokzan  
Timê hezkirine; dostî, pizmamî,  
Temîz bûye merem û xastinêd wan!

El-Ferabî, ewladê Rohilatê,  
Timê xêrxazbûye, bina cimaetê.  
Rojêd baş, azayî, serbestî didît  
Tenê biratî û yektîya wanda.

Miletê me kurdayî, surgûnkirî,  
Vir qesidîn çend car, bi tam hêsîrî,  
Dîtin wansebesrî, bûne mal-hal,  
Xelazbûne îdî, ji şîn û girî!

Bona milletê me, qazax bûn bira,  
Ew dîrvîn timê ji qezaya, sura,  
Miletêd lê tamam şane, bextewar,  
Merivhizî hatîye, bi kal- bavara.

### Cahalim

Gulbarîn, bedewa kaw û kubar,  
Çima minra tu usa bûyî neyar?  
Ezim, çar ku, weke nexaşê deh sal  
Şa neke neyarêd min, neve dilsar!

Ez tim diricifim, li ser rîya te,  
Bêhemd, diqerimim ji boy huba te,  
Însaf bike domam, dilême peritî,  
Bizanibe ezim, tek gumana te.

Pêpes neke, tu car, qewl sozê xun,  
Dax neke; qet kezev, pişik, dilê xun,  
Zanim tê poşmanvî, lê yê derengve,  
Min dîsa ji şake, bext mirazê xun!

Tu wext, tu neyarva, navî bextewar,  
Ji wan nagihîje, bona te hewar,  
Dexesî, bayîsî li dinê heye,  
Guh nede kesekî, nayne tera kar!

Weyne ber çeva, Xecê û Zîne,  
Ew eyanin tamam, goveka dinê.  
Ez bo te dilokim, wek Mem, Sîyabend,  
Cahalim, pirtûkam nede dadanê.



## Hesenê Hecîsilêman

Hesenê Hecîsilêman din di nava diroka wêjeya kurdê Yekîtiya Komarên Serbixwe da tê hesabê çawa helbestvanekî naskirî.

Ew zûva xwendevana ra nase û di nava wêjeya kurda da cîyê xweyî layîq girtîye. Hetanî naha çend berevokêd efrandinê wî "Dilê min", "Hesreta welat", "Rîya emir" û yed din hatine weşandin.

Goveka efrandinê Hesenê Hecîsilêman fire û rengawazin. Mijarêd efrandinê wî cudacudane: lîrîka, welatparêzî, hubû hezkirin, tore û telîm, bedewetîya "nexş û nîgarê tebîetê, dosr û bratîya gelane.

Xêncî nivîsê xweye xwexetîyê usa jî bi dehan helbestên klasîkên Rojhilatê û qazaxa wergerandîye zimanê kurdî, sercem û teqilê wanî orijînalî bi hostatîxweyî kirîye.



## Qazaxstanam

Mîna dayka xune ezîz te hez dikim, Qazaxstan,  
Tu ji minra bûyî dê da, wek welatê min Kurdistan.  
Çawa dayka mine delal, te vekirîye milê xwe,  
Wek ewladê xunî helal, hilgirtîye hemêza xwe.

Hemêza te usa germe, çawa hemêza dayka min,  
Minra gelek tu ezîzî, çawa buhuştî warê min.  
Welatekî şên û xweşî, dinyayê da nav nîşan,  
Wexta ji te dîr dikevim, halê min dibe perîşan.

Tu mêrgeke zehf bedewî, ez jî kulîlka te me,  
Bûyî tu kela sulhê, ez jî ewladê te me.  
Dinya –alem tamam zane, tu hez dikî edlayê,  
Bira her tim, tu bibînî îşiq-nûrê, eşq-şayê.

Sefîl, sêwî û jara ra bûyî cî-war, hêlîn, sitar,  
Nava tamam welata da bûyî tu welatê rêbar.  
Ez çivîka bê hêlînim, tu ji min ra bûyî hêlîn,  
Diceribîni dilê minî, bikeserî, kul-birîn.

Te hiş-aqil, sewda da min, bûme ez xweyî ezîfîyar,  
Xemê dilêmin te sivik kir, tu welatê bextewar.  
Ji bona gulvedana te, pir şa dibim, Qazaxstan,  
Pêşda here, tu gul vede, bibe gul û gulistan.

\*\*\*

Ax tu birê minî Qazax, berê tu jî mîna min,  
Ketî nava şer û dewa, azayî te dest anîye.  
Dijmin xûşk û birê te, mîna xûşk û birê min,  
Bela kirîye her derê, ser dilê te dax danîye.

Ewladê te Aûêzov, Velîxanov, Abay, Cambûl,  
Tu nehîştin nav tarîyê da û zulmê da  
tu car melûl,  
Serbestî û rizgarîya te dest anîne aqilbendî,  
Aza kirine kasiv, feqîr û jar, pale, gundî.

Bi qurna va û dewra va te dîtiye zulumkarî,  
Dêkabra geş, te ra anî azabûn û bextewarî.  
Naha aza nefes didî, dil xwe îdî nakî melal,  
Min ra bide şîrê helal, bijî Qazaxstana delal!

## Evdilê Îbrahîm Şemoyî

Helbestên Evdilê Îbrahîm Ji bi hezkirin, bi evîn, bi hesret, bi bêrîkirin, bi sirgûnî bi dûrî hatine hûnandin. Herçend jana helbest û peyvên wî wek seqema zivistana Zagrosan li ser dilê xwendevanadibere. Evdilê, peyvên xwe yên herî jandar, hêstên xwe yên herî xember, stranên xwe yên herî watêdar ji bo Kurdistanê, ji bowelatê jê dûr dibêje.



## Erezo

Wey Erezo, sirgûnî para min hat  
Çima ketî navbera min û welat.  
Hemberê min sekinîye Ararat.  
Dîtina te ceگرام nayê tebat,  
Rojek min ra tu bêje azadî hat  
Gellek ji te hêvîdarim, Erezo.

Qêrînim, te gazî bi awaz dikim,  
Ez kurim, welatê dayik hez dikim.  
Her gavê, her demê pêşewaz dikim,  
Bêriya vê axê ez derbaz dikim  
Baskê min tunîne, lê perwaz bikim.  
Dîtina welatê xwedaxwaz dikim,  
Bê wê derdmend, ax û zarim, Erezo.

Welayê min ket li destê neyara  
Lê hatin hev ereb, turk, qecera.  
Perçe kirin erd, axa me çar para,  
Zar û mezin wan qirkirin hezara.  
Sêwî mane îro li ber dîwara,  
Tu jî wek mindikêşî ah û zara.  
Her xul-xulê te dizanim, Erezo.

Dîroka da gellek kûre navê te,  
Ewrên tarîgur kirinsêlavê te.  
Çiqas xwîna gelêmtêv bû avê te,  
Şûştin, birin ev xwîna girdavê te.  
Jê dûr xistinî welat her gavê te,  
Hê bona metên hestirê çave te.  
Tu dinalê, ez dinalim, Erezo.

## Dilo


Dilo, li te ev çî tîre, çima dikî ax û zar,  
Tu ne nale, keç eşîre, ya tu lê bûy evîndar?

Wek bilbîla dikî fixan, li ser gula baharê  
Em naçîne pîr û şexan, emê biçindîldarê.

Tu nekşîne kul û xema, evîndarê, evîne  
Bila lêxe şûra, qema, li warê Mem û Zînê.

Wek bilbîla dikî gazî, tu gula sor dixwazî,  
Xweş awazî, dilûvîni evîna ber mirazî.

Ew axîna evîndara, nabe bext û nivîşte,  
Li qurbetê naçim karê, daxwaza me bihuşte.



## Mêrxasekî kurd: Ekrem Cemîl Paşa

Wî li Amedê şaxa Komeleya Kurdistanê (Kürdistan Cemiyeti) vekir.

Ekrem Cemîl Paşa (1891-1974) yek ji rewşenbîr û têkoşerên kurd e.

Mirovekî arîstokrat bû.

Neviyê desthilatdarê kurd ê Amedê Ehmed Cemîl Paşa û kurê Qasim Begê Amedî bû. Di zaroktiya xwe de di nav derfetên dewlemend de perwerde didî. Ji aliyê malbata wî bo xwendina zanîngehê tê şandin bajarê Stenbolê. Li wir bi rewşenbîr û têkoşerên kurd ên hemandemî re hevnasînan lîdardixê û bi piştigiriya Xelîl Xeyalî Begê Motkî dikeve Komeleya Xwendavanên Kurd (Kürd Talebe Cemiyeti) û di derxistina kovara Hêvî de chidgire.

Ekrem Cemîl Paşa bi tevî kurmamên (pismam, kurmam, kurap) xwe bi perwerdehiya endazyariyê diçin bajarê Lozana Swîsreyê. Ew li wir jî wekî malbat xebatên Kurdewariyê dike. Bi derketina Şerê çihanê yê yekem fikreke nû bi wan re rûdide. Împeratoriya Osmanî sedî sed têk diçû û heger kurd xwe birêxistin bikirana, wê hin destkeftiyên wan jî hebana. Ango ji bo sîdwegirtin ji şer, vedigere Stenbolê û tevî şer dibe. Osmanî û tirk sozê didin wê heger serkeftin hebe, wê mafên kurdan jî bê naskirin.

Ekrem Cemîl Paşa di nava refên osmaniyan de di şer de.

Li ser soza osmaniyan ew piştî perwerdeyê demkurt a leşkerî di eniyên Çanakkale, Mûş û Erzîromê de şer dike. Di heman demê de Mustafa Kemal Atatürk jî li Kurdistanê ye û li alîkariya kurdan digere. Atatürk li qonaxa Cemîl Paşayan li Amedê destê serokên kurd radimîse û serkeftinê tenê bi destên kurdan dizane. Ekrem Cemîl Paşa bi awayeke tarî tê birîndarkirin. Kurd şika Atatürk dikin lê ew bêsûcbûna xwe bilêv dike û Kurda îkna dike. Ekrem Cemîl Paşa wekî alîkarê xwe yê sereke destnîşan dike û bi nivîskî hin peymanan bi wî re mordike. Lê bi qasî demekê şûnde li Rûsyayê şoreşek rû dide û eniya rojhilatê êdî bêwate dibe.

Atatürk dixwaze kurdan di eniyên ereban da bikar bîne û hin sozên nû dide kurdan..com Kurd van bi van sozan jî dixapin û gorî hêza xwe tevî eniyên ereban dibin. Lê ereb biser dikevin û têk diçin.


Ekrem Cemîl Paşa li Amedê şaxa Komeleya Kurdistanê (Kürdistan Cemiyeti) vedike û dest bi avakirina sazûmaniya hevpar a dewleta kurdan dike.

Bi navê Gazî (Bang) rojnameyê Kurdî tê weşandin. Lê Atatürk êdî hêdî hêdî rûyê xwe yî rastegîn nîşan dide û dest bi çivan dike. Atatürk hin kurdên alîkarê wî ne peywirdar dike ku Ekrem Cemîl Paşa, Kamûran Bedirxan û Celadet Bedirxan bikujin û kiryarê jî tîxin stûyê hin malbatên ermenîyan. Gelek çalakiyên kuştinê vala derdikeve û kurd êdî hişyar dibin û hizra xwe ji Atatürk dikin.

Ekrem Cemîl Paşa mecbûr dimîne ku sala 1921'ê de Amedê biterikîne û avakirina sazûmaniya dewleta kurd bi paşve bihêle. Bi navê Evdilkerîm Axa kesekî ji eşîra Heverkî bi 50 zêrî wî dîl digire û teslîmê tirkan dike. Sal 1921 e. Salekê li Enqereyê di zîndanê de dimîne û li ser nerazîbûnên mezin ên kurdan tê berdan lê cezayê mecbûrmayîna li Enqereyê lê tê birîn. Ew dîsa xwe bi dizî digihîne Kurdistanê. Bi destpêka serhildana Şêx Seîd re tevî serhildanê dibe. Lê Atatürk bi fermaneke bilez hêj di destpêka serhildanê de wî û endamên malbata wî dide girtin. Bê dadgeh bi 10 salan tê cezakerin. Li girtîgeha Kastamonuyê de 3 sal dimîne û bi ruşveteke mezin xwe dide berdan. Tê gotin ku ew jî Atatürk re balafîrekê dikirin û li ser vê ruşveta mezin tê berdan. Hin dokûmentên fermî yên dewleta tirk jî viya sererast dikin. Atatürk bi xwe jî xelatekê artêşa esmanî dide wî û spasdariya xwe bi nivîskî pêşwazî dike. Ev dokûment hêj jî hene.

Di 29'ê adarê 1929'an de li ser pêkutî û casûsên Atatürk mecbûr dimîne direve Sûriyê. Li wir tevî hemî karên kurdewariyê dibe. Surî di bin desthilatiya fransîyan de ye û fransî dixwazin kurdan bo berjewendiyên xwe li dijî ereban bikar bînin. Ev yeka han ji aliyê rewşenbîrên kurdan re nayê pejirandin. Fransî Ekrem Cemîl Paşa dişînin sirgûnê. Heft sal di sirgûnê de dimîne. Li gundê Talîkê erdê ku kirîbû şên û abad dike. Traktor û makîneyên çandîniyê bikar tîne û raveyî kurdan dike. Zarokên kurdan fêrî xwandin û nivîsandinê dike. Li ser daxwaza tirkan dewleta Sûrî dest dide ser erd û milkê wî.

Ew êdî xizan û nexweş dikeve. Li Şamê di rewşeke kambax de jiyana xwe jidest dide.



Redaktorê sereke  
**HESENÊ**  
Êvdoyê Elî

Собственник Республиканское общественное объединение «Ассоциация «Барбанг» курдов»

Адрес редакции:  
050010, г. Алматы  
ул. Курмангазы, 40.  
Тел: (727) 267-07-49,  
тел/факс: (727) 291-37-06  
E-mail: [berbang@mail.ru](mailto:berbang@mail.ru)

Газет отпечатана в тип.  
«Алматы-Болашақ».  
г. Алматы, ул. Муканова, 223В.  
Заказ. Тираж 2500экз.  
периодичность – 1 раз в месяц.  
Цена договорная

Газета зарегистрирована  
в Министерстве культуры,  
информации и общественного  
согласия Республики Казахстан  
Регистрационный номер 5313-Г.  
от 28.07.2004г.  
Подписной индекс 65242

Мнение авторов публикаций  
не обязательно отражает  
точку зрения редакции.